

ROJA NÛ

KWEDÎ Û GERINENDE : MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrf; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojantû.

CENG & SIYASET

DEWRAN

STËRA KO VEDIMIRE

Meha Reştir

Eleman dikevin meha vî şerî a reştir. Bendên rojnameyên elemanî û rapor û nûçeyên ko ji hundurê Germanistanê digihin welatên bêteref tu şik na hêlin ko çavê xelkê şikivaye, û hêvî û niyaza wan ne maye.

Her Çend Ji Elaman

Li Hikûmeta xwe ranabin, bê dilî û perîşaniyeke ecêb bi ser wan de girtiye.

Serekên Germanistanê ên eskerî û siyasî, gelek caran li hev civiyane û li çareyên rakirina m'aneviyeta xelkê xwe geriya ne.

Hin Dixwestin Pale

Û xêbatkeran qanî bikin ko Germanistan û Sovyetistan bê zehmet dikarin libevbên; û hinên din digotin xelkê ko Hikûmet her tiştî dê bike dako Eleman û Dewletên Englo-Sakson, Britanya Mezin û Emerîka vî şerî ji nav xwe hillînin. Ev lorî û stranên honik-kirina dil û hişên xelkê, di kîjan meqamê de jî bêne gotin, çavê xelkê Germanistanê şikivaye, û agirê vên û xeyretê di dilê wan de temiriye.

Nûçeyên Tehil û Giran Yê

Ko ji eniya sovyetî tèn hal di wan de na hêle.

Xelkê hêj bêtir guhdariya Radyoyên britanî dikin û tiştên ko dibî hîsin di nav bajaran de zû belav dibe. Hefta borî bi tometa ko Radyoya Ingilîstanê bihistine deh eleman hatine girtin û bi qerara mehkema eskerî, ew dan ber tîngin.

Rewişa Eskerî

Edî dergehên erdê Qrimê di pêşiya Ordiya Sor de vebû ne, û di roavayê Melitopolê de, bihna elemana diçike û ew dibin derb û agirên çekên rûstî de dihelin. Ji Kremençûgê û heta Behra Azovê eniya elemanî bûye bir û perçeyên ji hev ketî.

Di beriya Nogaiskê de, eleman ketine perîşaniyeke giran ya ko ji a Stalîngradê jî mezintir e. Bala firên elemanî «Yunkers 52» bi piranî di ser qada şerî re difirîn û zad û zexirê fînin eskeran. Hatina wan, cihaba nexêrê ye. gava çavê leşkerên elemanî bi wan balafranan dikeve, dizanin ko dora wan hatiye girtin, û rîya xelasê ne maye, û edî bitenê balafr dikarin bîna hawara wan.

Li Gora Hawir

Û kaniyên selahiyetdar, qiwetên ko fro di destê elemana de ne ev in: 180 û heta 200 firçe der eniya sovyetî, 7 firçe li Finlandayê, 12 li peravên Norwêcistanê; 40 firçe di axa Fransê de, 25 li khergirava talyanî; û 18 di erdên Balkanê de.

Serdarê Ordiya Sor



Bavê Miletên Sovyetistanê Mareşal STALIN

QONFERENSA MOSKOVAYÊ

Qediyaqe, Qerarîne Heja Hatine Dayin

Civanê Moskoyê qediyaqe. Vê Qonferansê ji 19-ê çiriya pêşin û heta 30-î dom kiriyê, sala 1943. Wezîrên Britanya Mezin, Sovyetistan û Emerîkayê ên dervekarîyê M.M. Îdin, Molotov û Kordel Hal 12 civan danîne, û li ser pirsên siyasî û eskerî ên bingehîn, yên fro û sibê, demên şerî û piştî şerî li hev hatine. Li gora qerarên ko hatine dayin:

1.— Ceng heta wê roja ko tede Dewletên Mihwerê, bê bazar û axaftin, xwe bavêjin bextê Hevalbendan wê dom dike.

2.— Sovyetistan, Emerîka û Britanya Mezin, her tiştê ko ji dest tê, bikin da ko ev şerê xedar roj berê rojekê biqede. Li ser vê pirsê di nav bira General û moplzanên Hevalbendan ên eskerî de mijulahiyê heja û girane çêbûne.

3.— Elêmanên ko di erdên vegirtî de, zilm li xelkê kirine an ew kuştine dê bêne hikim û ceza kirin,

4.— Du kardarî dê bêne danin, yek li Londrê a din li Ceziyirê. Ya pêşin bi karên welatên «Swîrîpayê yên ko ji destê dijminan dê bêne xelas kirin û ya paşin bi pirsên Italyayê mijul bibin.

5.— Piştî şerî, Ewîstîriya ji nû ve dê bigebe biserxwebûna xwe. Xelkê Ewîstîriyayê divê niho ji bona serbestkirina welatê xwe canfidakariyê bikin.

6.— Piştî şênanandina Mihwerê û serfiraziya Hevalbendan, Kardariyeke Navnijadî wê bête danin û ev kardarî bi karê parastina silh û aştî û rahetî û ewleyiya cihanê û bi hemî pirsên ko pê girêdayî ne mijul bibe.

7.— Hemî miletên dinyayê, biçûk an mezin, wê bibin xwediyê erd û welatê xwe û tede bê ko ciranên xurt û zorker, têkîlî wan bibin an zilm û ta'dan li wan bikin ji bona xweşî û kamiraniya nefsa û milletê xwe, û cihan û dinyayê, dê bikarin bixebitin. «Ji xwe tiştê komîletên bêçare û zilm ditî dixwazin ev e.»

WEŞINGTON—Meha borî karxaneyên amerîkanî 8.362 balafrê çêkirine.

LONDRE—Dervedanên Britanya Mezin, di her deh heftan de ji bona şerî milyarek lîreyên ingilîzî ye.

Qewil û Ayîn

QEWIL

Şêxek rabû ji Xeydayê
Hewar şêxê min,
Berê xwe da bû Serayê
Hewar ruhniya min...
Koraniya ko bi çavê dayika
şêxa didayê
Hewar şêxê min!...
Şêx şehbedîn, şêxê xorta ye
Seyid Elî xudanê heft
tekyaya ye
Şêx Mihemed şîrîn biçûkê
bira ye.
Dayika şêxa, bi lezî
bile zîne
Eqîba Zêra bi xwe re
hilîne,
Berfîlê ji waliyî re bişîne
Terese qumandar fermana
Serê şêxa dixwîne...
Dor Xeydayê dar û bî ne
Li aliye heft tekyaya
Hez û şîr e.
Terese wali fermana serê
Seyid Elî dixwîne
Hewar şêxê min!...
Destê Seyid Elî li kelemçê
disidîne
Berê Seyid Elî dane meşneqê
Seyid Elî li ber meşneqê
disekinîne,
Stoyê Seyid Elî, li şerîte
dixîne
Bi emrê Xwedê, şerît di
stoyê Seyid Elî de diqetîne
Cara didiwa kursî li
bin lingê wîna de
datîne,
şêx Ebdil-Qadir imdadî
jê, ji Bexdê digîne,
Çel ircalê xeybê, li
meydanê sekinîne...
Cara sîsiya, terese qumandar
ji hikmê Rebê alemê
tîrsiya, ji stoyê Seyid
Elî, şerîte bi der dixîne.
Hewar şêxê min!...
Seyid Elî bi destê xwe ji xwe'r
Kursî li bin meşneqê datîne
Hewar şêxê min!...
Sê denga dikir qerênê
Ban ocaxzadan kir go:
Rebê Alemê, hikim
dimeşnê, hewar ruhniya
min!
Mîada Seyid Elî. li ezmanê
hefta de, diqetîne; Seyid
Elî bi destê xwe, stoyê xwe
de datîne,
Û lingê xwe li kursiyê
dixîne. Hewar ruhniya min.
Piştî wefata şêxa. Li dinyayê
ez ne minim. Hewar
şêxê min.

ORDIYÊN HEVALBENDAN

Li eniyên rohatat û roavayî pêf ve diçin

Di Eniya Talyanî de pêşveçûna Ordiya Emerîkanî pênc û a britanî heft bi serdestî dom dike, her çend ji erdê ko tede şer çêdibe gelek asê ye û baranîne xurt dibarin, û pê tevdanên eskerî giran dibin. Hevalbendan Iserniya standiye. Di Eniya sovyetî de rîya 250.000 eskerên elemanî ko di Qrimê de ne hatiye girtin. Di Dniepra jêrin de qiwetên elemana dikin xwe ji lepê Ordiya Sor xelas bikin û bikevin wê aliye avê. Ji bona hilweşandina eniya Dnieprê bi timamî; tiştê ko maye standina Kievê ye.

DEMA NIHA

KIEV KETIYE

MOSKÛ— Ordiya Sor bi êrîşeke xurt Kiev standiye.

ZEFERA SOVYETISTANÊ

BI MILYONAN ESKER Û ÇEK JI QIWTET KETINE

MOSKÛ — Bi awakî resmî didin zanîn: Ji 5-ê firmehê û heta 5 ê çiriya paşin a 1943 xesarên elemana ev in: Zererine diyar gihaye 144 firqeyên peyde û 28 firqeyên zirh û motorkirî. 2.700.000 eskerên elemanî ji qiwet ketine tê de 900.000 kuştî û 98.000 hêşîr bene, Ordiya Sor 9.900 balafir, 15.400 tang, 890 otomobilên zirhkirî, 13.000 top, 13.000 qumbereavêjên çeperan, 50.000 mitralyoz, 390 wa gonên Banzîn kêş, 25.000 motosikil, 900 traktor, 13.000 keymyon û otomobîl, 4.000 wagonên trenan, 300 loqomotiv, 2.000 depoxane xira kirine. Leskerên rûsî standine: 289 balafir, 2.300 tang, 190 otomobilên zirhkirî, 6.800 top, 6.180 qumbereavêjên çeperan, 24.460 mitralyoz, 7.759.000 gulle, 2.100.000 lexemên teqandinê, 300.000 bombe, 1.506.000 ton torpîlên tanga, 400.000 tîfing û otomatîk, 100.000.000 berik û 50 milaon mêtir tél.

DU HAZAR BALAFIR

Di Nav 24 Saetên Dawîn de 4,000 Ton Bombe

Avêtine Hejagehên Axa Elemana

LONDRE — Di nav 24 saetên dawîn de refên britanî û emêrikanî 1.000 ton bombevên gewat û teqandinê. Ji tîpên giran û girantir avêtine bajarên Germanistanê. Bombardimana şaristanê elemanî Dusseldorf 27 deqîqan dom kiriye û di vê navê du hezar ton bombe li karxane, febrîqe û destgehên vî bajarî ketine.

QAHIRE— Wezîrê Brîtanya Mezin ê dervekariyê Mr. Îdin hatiye payetextê Misrê.

MELBURN— Yekîneyên Hevalbendan ên behrî, heft cengkeştî û 3 barkêşên japonî bin av kirine û di şerên hewayî de 30 balafîrên japonî avêline erdê.

MOSKÛ— Radyoya Moskovayê duhî êvarê digot; Ordiyên Sor mîna bîrîndeyekê ber bi Xarsonê ve pêş ve dikevin. Tangên rûsî ber bi sulavên Dnieprê ve dimeşin, û siwarên sor qiwetên elemana yê ji hev belav bûyî diqelînin. Elemana di dora sulavên Dnieprê de bi kozîk û çeperan û bi erdên lexemkirî, ji xwe re asêgehêk çêkirine, lê tu tişt nikare pêş ve çûna Ordiya Sor bisekinîne.

EONDRE— Qiwetên britanî derketina erdê piştçeperên elemanî, ê axa Italya Bakurî,

MOSKÛ— Çar sed peya hatibûn vaxwendin sifra ko mareşal Stalin ji bona qedergirtina mêvanên xwe Mr. Îdin û Mr. Kordel Hal danî bû. Li ser sifrê ji bîst carî bêtir badin hatine hilanîn û vaxwarin ji bona xweşiya Mr. Çorçil û Râtzwelt û ji bona serfiraziya Ordiyên pênc û heşt û ya Sor.

LONDRE— Şevêçûyî payetextê britanî de îşareta Talûkê hatiye dayîn, lê pir dom ne kiriye. Çend bombe ketine taxeyên Londre ên dût.

ENIYA ROHELÊT

Re vişa Qiwetên Elemanî Hin Bi Hin Zehmetir Dibe

Cengê azakirina axa Ukranyayê kettiye dewra xwe a birinî. Qiwerên rûsî ên mezin, zora xwe didin rêhesina Dniepropetrovskê, rêhesina dawîn ya ko hêj di destê elemana de ye. Hêke ev rê ji hatiye birin, edî hevî û xelasiya leskerên elemanî yê ko di enişka Dnieprê de jne, na mîne, ji xwe fro ji li wê, çûn û hatin ji bona elemana gelek zehmet bûye. Bi vegirtina Verxovtsevovayê Ordiya Sor rêhesina Dniepropetrovsk — Krivoy Rogê biriyê. Yekîneyên sovyetî bi lez ber bi Krivo Rogê ve dimeşin, û tête bawer kirin ko ev bajar jî, di nav çend rojan de wê bikeve destê Ūrisan. Di bakurê Kievê de wilo dixuye ko zordana rûsî hinik nermatir bû ye, lê di nîroyê vî şaristanî de Ūris dijminên xwe gelek dişindin. Ordiya Sor piştî vegirtina Melitopolê wextê xwe wînda ne kiriye. Qiwetên General Tolbuxînî dane pey elemana û bernadin ko ev esker bi gûnda çûyîne de çavê xwe vekin û bihna xwe bibin.

Refên rûsî jî, xesarine giran digehînin qiwetên elemanî ên şkêrandî. Niho tête seh kirin ko Melitopolê de zehf gerevaniyên elemanî, bi deh hezaran, haline kuştin û elemana gelek çek û posatên heja di cih de hiştine. Lê belê hêj

qesda Serdariya sovyetî xweş naye seh kirin. Êrîşa ko di nav bîra Kremençûng û Dniepropetrovskê de destpê kiriye gelek mezin e, qesda vê êrîşê gelo neqeb kirina xetên elemana ye an bitenê bi gûnda zivirandina qiwetên elemanî?

Niho sê ordiyên elemanî, hemî bi hev re 50 firqe ketine tengiyê.

Lêbelê eleman bi çavsofî û hinerwerî şer dikin û gava hewce dibe dest ji canfidakariyê na kişînin, û heta niha zehf caran xwe ji tengasiyê, û ji rewîşên giran xelas kirine. Ji aliyê din wilo dixuye ko elemana di Ukranya Roavayî de ji xwe re rêkê otomobîla a reh «Otostrad» çêkirine û ev rê niho, bi gûnda kişandina qiwetên û anîna gaziyan de bikêr tî.

Cihan li Sovyetistanê dinere ya Stalîngradê hêj mezintir, bi ser

Di Ukranyayê de dikarê bela elemana de bê.

Ji aliyê din sê wezîrên dervekariyê. MM. Îdin, Molotov û Kordel Hal di Moskovayê de hero bi hev re sê çar saetên dixebitîn.

Her çend jî xebata vî civanî veşartîye, nas e ko her sê wezîr bi dilekî pak, bi dostaniyêke paqij û bi vênêke xurt tevkariyê dikin û karê xwe pêş ve dajon, ji xwe ji bona fro jî ev bes e,

MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYEN SER Û AŞTIYE

ÇEKOSLOVAKYA

Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdesti

Xelkê Çekoslovakyayê pîncsed sal di bin hikmê miletên biyanî de mane, azahî û serbestiya xwe wînda kirine, di bin zilm û zorkeriya neyaran de bê tab û tîwan ketine, lê dest ji xebatê berne-dane, agirê dilê wan ne vemiriyê, ber êkis eşq û hevîniya welat di dilê wan de maye û xurtir bûye û sala 1918-an de, piştî şerê mezin î kevîn, bûne xwedî dewlet û hikûmet. aza û serbest.

Lêbelê, sernivîştî wan a reş wilo xwest, piştî bîst û pênc salên azahî û serbestiyê, berî pênc salan jî nû ve ketin bin destê dijminan, hikûmeta Çekoslovakî hatiye rakirin, rojnama û kovar, medrese û dibistanên wan hatine girtin. Di pêşiya vî tiştî de miletê Çekoslovak çî kir; sûret û wêneyê: jêrîn pêş me dikin.



Keç û dot û jin bi hezaran çûne Sovyetistanê û tenişta eskerên rûsî de şerê neyaren welatê xwe dikin.



Pir û civan ketine eskeriyê. Serdarê Çekoslovakî General Ingr silav li eskerên Çekoslovakyayê dike.



Bergehek ji yê payetextê Çekoslovakyayê Prag. Ev sûret bi gev hatiye girtin, gasingeha St. Venseslasî û şehreyên dora vê Gasin, gehê şanî me dide.

LONDRE— Meha borî refên emêrikanî 4.690 ton bombe avêtine hejagehên elemana û 784 balafîrên elemanî xistine erdê.

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HERDOMADAIRE
DE LA GUERRE

Légère avance des armées alliées en Italie où Américains et Britanniques doivent surtout surmonter les difficultés inhérentes au terrain et aux conditions atmosphériques.

Complète déroute des armées allemandes dans les steppes de No-gaïsk.

La Crimée est complètement isolée.

Les forces soviétiques franchissent le Daïepr en plusieurs points sur son cours inférieur.

Les unités de la Wehrmacht tenant encore dans la région de Krivoï-Rog sont à la veille d'être encerclées et anéanties.

Des patrouilles de l'Armée Rouge tâtent les positions ennemies dans le secteur au nord de Gomet, sur la partie centrale du front.

Telle est la situation générale en ce jour d'anniversaire de l'URSS — du 7 Novembre, et voici en quels termes Moscou commente les événements:

Il y un an, les Allemands tentaient en vain de franchir la Volga. En Octobre 1943, ces mêmes Allemands ont tenté en vain d'empêcher les Russes de franchir le Dniepr.

Les douze mois qui viennent de s'écouler peuvent être géographiquement encadrés dans l'espace d'environ mille kilomètres situés entre ces deux fleuves. C'est ici que se sont déroulés les événements militaires les plus importants de l'année. Toute cette étendue de plus de mille kilomètres est jonchée de cadavres allemands.

Pendant toute une année, la Wehrmacht a reculé sans cesse, sans parvenir à s'arrêter sur l'un ou l'autre des nombreux obstacles fluviaux, le Don, le Donetz, la Soj, la Desna, le Dniepr.

Ce n'est plus la même armée allemande qui se ruait alors à l'assaut de la Volga, qui de Mozdok cherchait à atteindre Grozny et Bakou et dont un détachement de troupes spéciales escaladait l'Elbrouz, dans le Caucase, pour planter au plus haut des monts un drapeau à croix gammée.

Rien ne semblait alors impossible aux Allemands, persuadés de l'invincibilité de leurs forces. Au jourd'hui, la Wehrmacht est affaiblie, saignée à blanc. L'Armée Rouge par contre est plus forte, mieux entraînée, — mieux armée. C'est à Stalingrad qu'a pris fin l'année de victoires allemandes. Aujourd'hui, les troupes de Hitler se battent encore avec la rage du désespoir, mais sans enthousiasme et sans foi.


La propagande nazie pour calmer l'inquiétude de son peuple et de ses satellites a d'abord inventé la théorie de la «défense élastique». Puis, le Haut Commandement de la Wehrmacht a mis tout son espoir en d'autres arguments, météorologiques ceux-là: mais ni la pluie ni la boue, ni l'allongement des lignes de ravitaillement n'ont freiné la — marche irresistible des détachements cosaques aussitôt suivis par des colonnes de tanks légers.

La propagande allemande pouvait encore duper son peuple en 1942, mais 1943 a dissipé bien des

2^e ARTICLE D'INITIATION SUR LES CHARS DE COMBAT

"CHARS DE COMBAT" OÙ "TANKS" MODERNES

D-1 (13 tonnes) le premier char de combat français adopté pour remplacer les matériels de 1918



Les tanks actuellement en service dans 65 différentes armées appartiennent à de nombreux types plus ou moins lourds, rapides et armés, mais tous ont les mêmes caractéristiques essentielles: leur armement principal, un canon, est installé dans une tourelle qui peut tourner sur elle-même grâce à un moteur; le ou les moteurs actionnant les chenilles sont placés à l'arrière du «caisson» blindé qui constitue le char; le conducteur est installé le plus haut possible à l'avant pour avoir les meilleures vues. Dans presque tous les chars modernes moyens ou lourds, la tourelle entraîne dans sa rotation une sorte de cuve dans laquelle se trouvent le chef de char et les servants du canon.

Le premier char répondant à la plupart de ces caractéristiques a été le petit

char français RENAULT essayé en Juin 1917. Le RENAULT F. T. ne pesait que 6 tonnes, et n'était ni fortement blindé, ni rapide, mais son canon de 37 m.m., précisément placé pour la première fois, sous tourelle, pouvait tirer dans toutes les directions et se montrait très efficace contre les mitrailleuses qui jusqu'au milieu de la dernière guerre, avaient infligé de grosses pertes à l'infanterie, bloquant la plupart de ses attaques.

Le véritable prototype du tank moderne, de dimensions et d'armement correspondant à ceux des meilleurs actuellement en service, a été le IA-F.C.M., char français également, essayé en fin d'année 1917. L'IA-F.C.M., pesant 41 tonnes, et long de plus de 8 mètres, portait sous tourelle, un canon de 105 m.m. lançant des obus d'une

quinzaine de kilos. Ce char pouvait franchir des fossés larges de 3m, 50 et des murs hauts de près d'un mètre. Il ne dépassait pas toutefois la vitesse de 6 kilomètres à l'heure, celle d'un homme au pas.

Actuellement, les tanks peuvent être classés en catégories par leur poids: tanks «légers» pesant de 15 à 15 tonnes, «moyens» de 26 à 30, «lourds», d'une quarantaine de tonnes, «très lourds» enfin, atteignant et dépassant 60 tonnes.

Dans la première catégorie, les tanks américains M-3 ou «General Stuart» et surtout M-5, plus récent, sont remarquables. Ils dépassent largement la vitesse de 50 kilomètres à l'heure, sont extrêmement maniables, et bien armés pour leur poids d'un canon de 37 m.m long et de plusieurs mitrailleuses.

Dans les chars «moyens», aptes à toutes les missions, les meilleurs sont le T-34 russe, de 26 tonnes, et le M-4 ou Sherman américain, de 30 tonnes tout chargé.

Le T-34, protégé par des plaques de blindage de 45 à 70 m.m d'épaisseur, atteint cependant le 50 à l'heure, grâce à un moteur de 500 cv et peut parcourir sur bon terrain plus de 400 kilomètres sans ravitaillement. Il porte sous tourelle un canon long de 3 pouces (ou 76 m.m 2) extrêmement puissant.

Le Sherman, de même longueur, environ 6 mètres, mais un peu plus haut: 2m 80 environ au lieu de 2m 45, offre plus de place à l'équipage. Malgré un moteur de 500 cv également, il est un peu moins rapide. Son armement consiste en plusieurs mitrailleuses. L'une de celles-ci, de gros calibre, peut tirer contre avion.

Les canons qui arment ces chars lancent à une très grande vitesse des obus de 6 kilos environ qui peuvent traverser de forts blindages.

Les tanks lourds, «CHURCHILL» anglais, de 40 tonnes, et «KLIM-VOROCHILOV», russe, de 41 tonnes, sont très fortement blindés. Ils sont ainsi moins rapides que les précédents, environ 35 kilomètres à l'heure.

(À SUIVRE)

illusions: la Wehrmacht n'a plus enregistré le moindre succès après Stalingrad: elle n'a fait que reculer depuis, et dégringoler de plus en plus bas.

A Kharkov et à Orel, à Stalino et à Taganrog, à Smolensk et à Briansk, à Tchernigov et à Poltava, partout les Allemands ont tenté de s'arrêter; ils se sont accrochés désespérément à ces villes, mais l'Armée Rouge les en a délogés de l'une après l'autre.

Et dans leur retraite, les Allemands abandonnent villes, fortifications, armes, munitions, vivres et souvent leurs blessés.

La machine de guerre nazie tient encore, il est vrai, mais elle craque déjà et se disloque. Et ce qui craque et s'effrite plus encore que le front c'est le moral du peuple allemand.

L'Allemagne est en pleurs; elle gémit. On commence à murmurer et même à proférer des menaces à l'encontre du Fuhrer qui a si mal

conduit son peuple de seigneurs vers la victoire promise.

En URSS par contre, le moral est plus élevé que jamais. La production du pays augmente de jour en jour On reconstruit et on laboure jusque sur les arrières immédiats de la ligne du front. La reconstruction des villes et des villages fait des progrès rapides.

L'Etat Soviétique a 25 ans. 25 années de victoires de toutes sortes. Les coups que l'Armée Rouge a portés à la Wehrmacht ont étonné le monde. Le bloc hitlérien se décompose. L'exemple de l'Italie inquiète la Roumanie et la Hongrie.

Il y a un an, le Maréchal Staline disait:

« Le jour viendra où ce sera à notre tour de célébrer des victoires »

Aujourd'hui, Moscou salue par des salves d'artillerie les victoires de ses héros. Le jour approche où la capitale de l'URSS annoncera au monde la victoire finale.

Strana Kurdi

XERABO...

Xerabo.. Xerabo
Tu bi xaxkal û bi gotinê çênabo
Malê te pirê ji canê te re edabo
Qama te kin e
Hemberf taximê memkê mi nabo
Şevê kanûna dirêj in
Tu ji ber serê min ranabo,
Tu bi şexê qureyşiya bî
Sed werdê tê di bêrika mi de be
Qeniyatiya dilê min bi te na bo.

Go Xerabo... Xerabo
Havin e, xweş havin e
Nanê ceftin e, dewî tirşin e
Ser rax û bin raxa min û
bejna zirav;
Ebake şaft ne
Heçf derdê dila ne di be
Bela ne bine.
Xerabo... dîno...
Mi bihstf tu zewicf
U te yek xwestf
Ezê tu nifira li te nakim
Tu dîrf dest f
Xwedê teala bike, rehî
Goştê canê te bihele
Li hewa bimîne, komik hestf.
Taliya paşf, bila tu kwîr bibe
Têkevî ber vî destf,
Xerabo dîno bila li te be
Li wî diff
Li mala bavê te bî
Li wî sewdayf, li wî aqilf,
Çawa te dev jî min kara xezala
berda
Tu f li bergîla serê tewla
Hesilf.
Kul û kederê te giran in
Tu car dernakevin jî vî diff,
Terka bejna zirav nakim
Heya axa merzela
Kêlê di kevirê.
Keçikê ban dikirf lawiko
Serê memkê min xatûnê
Mîna tiriye Çelîkê Eliyê Remo
Di çax û benga xwe de digihiya
U di mewa xwe de dikemilf,
Mîna qesrê pirota
erê mihela meşklîna
Li bajarê Mêrdînê a vekirf.


TACDIN

Dilê min dilki li dîn e
Bela xwedê topekê li mala Izedîn
xîne;
Şewir û mişawirê giran, li Çola
Hesarê danîne.
Ban li melê kirinê, dibêjin qelem
û dewêtkê xwe bine,
Kaxetkê emê ji mala Tacdîne mala
Heçf Osman re bişnin.
Gava vê kaxetê, digihine destê
Tacdîni, Tacdîni li vê kaxezê.
dimeyîzîne...
Ban Elîkê Heseyn kiriyê, ma'qulê
Pêparê...
Dibêje çend peyan, ji gundê Pê-
parê bi xwe re hilîne, me bihistiye
Izedîne Mala Temo, û Xelîlê
Betê, bi koma giran ve, bi fereca sibeyê
wê bavê ser gundê qirqatê, ser
Qesra mala Use Şehîn.
Dilê min, dilki li dîn e
Tacdîni û Elîkê Hiseyin, bi çend
peyan, rêka Qirqatê digirin û
dilezînin...
Xwedê teala, xira bike, mala
Izedîni, bi sê kemîna, li dora Silo
Hemzo, li xirbê kinyasê rûniştine.
Şade û şihudê Tacdîni gelek hene,
go: her sê kemîna diqênînin û
bi ser gundê Qirqatê diqulpînin..
Dilê min li hêra... Sed car li hêra..
Şade û şihudê Tacdîni hene, da
xencerê û ket kozka diyê e, û bi
sê denga ban kir Izedîne go: dilê
min dilki li dîn e, qerara Xwedê li
nefsa canê min keti be, dilê min
li hêra, ezê li ber vê kozikê rakim
kerxa mêra, Izedîni banî kirê; go:
dilê min dilki li dîn e, hege nişana
êvarê wînda bibe, ezê bi çimê te
digirîm û ji wê kozikê bikîşnim
Wî lê wegerad û got: xaxkalê xwe

û zêdf bavê xwe me bêje, go: gelek
carf, te derbê mi, bi çavê serê
xwe dîne.
Izedîni banî Tacdîni kirê û got: qerara
Xwedê bi nefsa canê min keti be,
ezê te neha bikîşnim ji wê kozikê.
Izedîni ban racniya, mihaçniya
kir û koma giran û go: hemî pakête
li tîfingê xînin û hicamê ser bikin!
Tacdîni bi sê denga ban Xelîlê Horê
kir, go: dilê min dilki li dîn e, şahid
û şihudê xalê te Tacdîni gelek hene
û Xelîlê Horê lê veqerand go: Tacdîno
Xalo, dilê min li dîna e; tîrsa min
derbê li te xînin, wê sinfikê mala
Hesen Şemdin, ji dinyayê biqellînin
rokê rev çêtir e, ji desthilanîne.
Tacdîni li xwarziyê xwe Xelîlê
Horê veqerand û got: tu çawa revê
û xalê xwe qeyas dikî...
Dilê min li dîn e... ez vê kozikê tu
carf ber neyara bernadim, bê xwîne
Bi sê êrişê êriş kirin bi ser
Tacdîni e, derb û berek lê dane,
li bejn û bala Tacdîni, laşê
wî ket, li kozikê bi birn e.
Izedîne mala Temo go:
ez bala xwe didimê, ne ma te
hîsa Tacdîne,....
Nûriyê Lewand bi sê denga ban
kir Xelîlê Horê; go: vê bihnê;
xalê te serê xwe daniye razayê..
Xelîlê Horê bi sê denga ban kir
Nûriyê Lewand; go ez ne ma zanîm,
xalê min ya kuştiye, ya birn e.
Nûriyê Lewand pakête li
tîfingê dixîne û xwe li koma giran
diqelîpîne, pênc peya li hêla bezê
dikuje. Heyfa min tê li ser Tacdîni,
laşê wî li kozikê, li hêla neyaran
xîmîne. XELILÊ METÎN!

PÛJINÊN DINYAYÊ

CENG & BIHINGEH



Tang Bi Hezaran Ji Karxaneyan Derdikevin û Berê Xwe Didin Eniyên Cengî. Mîna Sala 1918-an Tang Zora Elemana Dibe.



TANGEKE FRENŞIZÎ PÊŞ VE DIÇE

LONDRE- Leşkerên Yugoslavî ketine Mecaristanê û tede gerê neyaran dikin.
RIO DE JANEIRO - Bi awakî resmî didin zanîn: balafireke brêzilî ji nişka ve bi ser noqaveke dijmin de girtiye û ew bin av kiriyê.
LONDRE- Komîte britanî a arîkariya Ordîya Sor, ya ko dibin sermîyanîya Sîtiya Çorçil de ye 4.00.000 (çar milyon) lîreyên inglîzî kom kirine, piraniya mirovên ko ev pere dane xebatker in.
MOSKÛ- Hikûmeta Sovyetistanê ji 118 mêrxasan re payeya Egîdiên Sovyetistanê dane, di nav wan de esker serbend û 3 general hene. Ev egîden he hcmî, di şerên Dnieprê de mêrxasiya xwe şanî neyaran dane.
LONDRE- Qerargeha leşkerên Kenadî a mezin li Londrê e- lam'dide ko ji panzde serbend û şerevaniyên Kenadî re nişanî frensîzî a mezin Croix de Guerre hatiye dayîn.
LONDRE- Wîlo dixuye ko serekên tînyanî ên liberal û de mokrat mîna kont Sforza û Krose na xwazin di bin emrê Kralê Ital- yayê Viqtor Emanuel de, xidmeta welatê xwe û arîkariya hikûmeta Badogliyoyê bikin. Text û Tacberdana Kralê Italyayê bi awakî zor- aîveyê aştîneyê.